

Şehîdê vî welatî ...

Dilovaniya Xwedê li te be , Şehîdê xewna me

\*\*\*\*\*

Di rêwresmên behiya Şêrzad de, li bajarê Herne/Elmanya, ji hêla mamoste Heyder Omer , ev deqê jêrîn hate xwendin.

### Li kujerê Şêrzad digirim

*Diyarî ji bo giyanê Şêrzad; kulîka ciwanan*

Sala 1991ê min di helbestekê de got: Kurdo! Bi kurdî rabe û danîş bi kurdî. Bi kurdî buxwe û vexwe bi kurdî. Bi kurdî govendê girêde û biken kurdî ne tenê her tim tu digrî bi kurdî.

Ji wê rojê de, ez li xwe digirim, li te digirim, li wê û wî digirim, li wan digirim.



Ne min xwe dît, ne hûn û ne ew. Tenê min rondikên kurdî û refê tîtiyan dîtîn.

Ji sala 1965ê heya sala 2012ê, min ne pirtûkek û ne defterek hêşt, ne kovarek û ne rojnameyek hêşt, ne pênuşek û ne elfebayek hêşt, li kujerê Şêrzad; kulîlka ciwanan digirim. Min xwe û hûn û 32 patrî dîtîn. Ji wê hîngê de, min ne helbestvanek û ne nivîsevanek hêşt, ne nezaneke û ne zanayek hêşt, ne rewşenbîrek û ne filozofek hêşt, ne şagirtek û ne maosteyek hêşt, ne bervedêrek û ne bijîjkek hêşt, li kujerê Şêrzad; kulîlka ciwanan digirim. Min xwe û hûn û 32 partî dîtîn.

Ji wê hîngê de, min ne dengbêjek û ne sergovendek hêşt, ne bilûrvanek ne tenbûrvanek hêşt, ne gundiyeke ne bajariyeke hêşt, ne cotkareke ne karkareke hêşt, li kujerê Şêrzad; kulîlka ciwanan digirim. Min xwe û hûn û 32 partî dîtîn.

Ji wê hîngê de, min ne olek û ne ayînek hêşt, ne mezhebek û ne têorek hêşt, ne dostek û ne dijminek hêşt, li kujerê

Şêrzad; kulîlka ciwanan digirim. Min xwe û hûn û 32 partî dîtîn.

Ji wê hîngê de, min ne keçek û ne xortek hêşt, ne mêrek û ne jinek hêşt, ne biçûkek û mezinek hêşt, ne kalek û ne pîrejinek, hêşt, li kujerê Şêrzad; kulîlka ciwanan digirim. Min xwe û hûn û 32 partî dîtîn. Ji wê hîngê de, Ji çemê Dicle û ji Eyndîwarê heya çemê Êfrîn Çiyayê Kurmênc, min ne girek hêşt, ne deştêk hêşt, ne pesarek û ne dagerînek hêşt, ne baxek û daristanek hêşt, ne gundek û ne bajarek hêşt, ne kolanek û ne berqefek hêşt, ne şikeftek û ne serayek hêşt, li kujerê Şêrzad; kulîlka ciwanan digirim. Min xwe û hûn û 32 partî dîtîn.

Langenhagen/Elmanya, 18. 02. 2012

\*\*\*\*\*

Ji **Amedê jî kek Îbrahîm GUÇLU**, bi boneya sersaxiyê , ev deqê jêrîn bi rêkiribû.



Heval, Dostên Hêja ...  
Min bi gelek xemgînî  
bihîst ku Dr. Şêrzad  
Hac Reşîd, birayê  
hêja endamê Rêxistina

Helebê ya PYDKS ê, di 09. 02. 2012-an de nêzî nexweşxaneyê El-Eleml ji aliyê sixûr û xwînmijên dehaqî Dîktatoriya Esad û an jî hevalbendên wan yên kurd de hatiye revandin û hatiye kuştin.

Ev kuştinên kurd û ereban, qetlîfama Dîktatoriya Esad/Baasê nikare pêşiya hilweşandina xwe bigre. Lewra tê zanîn ku rejîma baasê û zihniyeta baasî ji derveyî zihniyeta sedasala 21-an, ji derveyî demokrasî û maf-azadiyên mirovî ye.

**D.R 8**